Azadîa rastî çi ye?

Rast e "azadîa rastî" çi ye? Heker me zanî ba dê me jîana her u her hebit, belê ew dê azadîa rastî bit!

Belê mebesta rast ya Krismesî derbarê dîarîya ye. Jîana her u her dîarîyek e ji destê Xwidê têt. Bila em seẖkînê dîarîyêt Xwidê u em ji bîr ne kîn.

Dîarî

Dîarîya êkê – jîan. Xwidê jîan daî me – Xwidê em çêkirîn. U çawa lê hat? Li destpêkê Xwidê bi Peyvê xu axift (ferman da) u cîhan çêkir.

Dîarîya dûê – pêẍember. Xwidê zelam wek Musa u Îbrahîm dan vî şulî: peyvê Xwidê bidin miruva da pîa Xwidê bikin u bijîn.

Dîarîya sîê – ʻÎsa. Çunku Xwidê ẖe ji me dikit, dîarîyekê gelek mezin daî me. Xwidê ʻÎsa bu me hinart! Tijî sala ji berî Xwidê ʻÎsa Pêẍember hinarte cîhanê, deykbîna wî hat pêẍemberatî kirin.

ʻÎsa taybet e u me çi car wek pêẍemberek dî ne dîtî ye. Ew dîarîe ji Xwidê **bu ẖemî cîhanê ye**, ne bi tinê bu êk milletê.

(1) Deyka ʻÎsaî kiça kiçîn bî.

(2) Cihê deykbîna ʻÎsaî pêẍemberatî bi rê ve bir u Xwidê li bajêrê Beytleẖim (bajêrê Daûd Paşayî) da.

(3) Tijî frîşteyêt Xwidê deykbîna ʻÎsaî ragehand: gut deyka wî u mêrê wê u hindek şivana.

(4) Stêra ʻÎsaî hindek stêrnas ji rojhelatê înan mala wî da wan şîan ʻîbadeta wî bikin. (Çîrokê li perê sîê li vê guvarê bixwîne.)

U buçî ʻÎsa bî miruvek u hat li gel me? Da me azad bikit u da me dê runahîya rast hebit.

"Gîanê Xudanê rêzdar li ser min bit, çunku Xudanî ez çewir kirim, da mizgînîê bidime belingaza, ez hinartim da brînêt dil şikestîya bigirêdim, da daxwaza berdana zîndanîa bikim u yêt jêrdest jî bi azadîê, da destura Xudanî ya wergirtî rabigehînim, u roja tol vekirnê bu Xudayê me, da xema dilê wan ez hilgirim." (pêẍemberatîa Eş'îyaî)

Dîarîya çarê – jîana her u her. Belê em u ew miruve Xwidê li destpêkê çêkirîn pîa Xwidê ne kirî ne u ji ber hindê ji Xwidê dîr kirî ne - bi gîanî mirin u dîmahîê bi leşî mirin. Belê Xwidê divêt miruv li gel wî bin (ye'nî sax) u ne vêt miruv jê dîrkirin (ye'nî mirî). Xwidê divêt em li gel wî her u her bijîn.

ʻÎsa jîan e! ʻÎsa hat da ewêt ku bawerî bi navê wî înaîn, maf da wan bibine biçîkêt Xwidê. Bi rêka ʻÎsaî Xwidê tarîya me dikite runahî.

Em ber çakîê Xwidê u bi bawerîê qurtal dibin u ne bi kirîarîêt xu. Heker em qebîl bikîn ew dîarîe ji Xwidê (yê ʻÎsa) u bawerîê pê bînîn, belê dê bu me jîana her u her bit. U piştî leşêt me dimirin, em dê her u her li gel Xwidê mînîn.

U ewe azadîa rastî ye.

"Belê rêzdar bi Xwidê nîşanekê dite we: Eha **ya kiç avis dibit** u **dê kurrekê înit** u dê **navê wî kite ʻEmanuîl**. … **Dê bu me kurrek hebit** u dê kurrekî dite me, barê serukayetîê li ser milê xu ragirt. U navê wî dê <Seyr> bit, <Rawêjker> bit, <Xwidêyekî bi Şîan> bit, <Babekî Hetahetayî> bit, <Serukê Aştîê> ye, u nabite dîmahîkek bu gejbîna serukayetîya wî u aştîê jî." - pêẍemberatîa Eş'îyaî

"Belê tu ey **Beytleẖim**a Efirate. Her çende tu ya biçîk î dinav gundêt Yehuda. Belê dê bu min êk ji nav te derkevit u dê bite paşayê Îsraîl u binîatê wî yê kevin e u ji berî hemî tiştî ye u **çi destpêk bu nîne**." - pêẍemberatîa Mîxaî

"Eve ezê mizgînîya dilxuşîeka mezin di dime we u dê bite dilxuşîa gelê we ẖemîê. Evru li bajêrê Daûdî **Qurtalker**ek bu we yê ji deyk bî ye, ew jî **Mesîẖ**ê Xudan e. Eve jî nîşana wî ye: Biçîkekê dinav pata da pêçaî u di hafrî da nivîstî ye. … Mezinatî li bilindîa bu Xudaî u aştî li ser ʻerdî bu miruva u dilxuşîa Xwidê lê." - Ragehandina firîşteyêt Xwidê bu şivana